# Griffbereit

Familien entdecken gemeinsam
Spiel und Sprache

Kommunale
Integrationszentren
NRW

ISO 639-1: ku

# Amûrên ji bo dê û bavan[1]

Ev amûra ku meha Adara sala 2020’an ji hêla eyaleta Bakur Ren Vestfalya wezarete entegrasyonê ya zarok, malbat û penaberan (MKFFI) û weqfa Auridis Foundation gGmbH (pargîdaniya bi berpirsiyariya tixûbdar a ne-berjewendî) ve tê finansekirin.

Bingeha alavan li jêr RAA[2] (niha: Navenda Entegrasyona Komûnal)

- RAA Navçeya Düren
- RAA Navçeya Aachen
- RAA Aachen
- RAA Gelsenkirchen

û şêwirmendên dê û bavan Gülten Doğan, Sabine Engelmann û Nadja Pazzini û bi desteka weqfa Freudenberg û li gor bernameya „Bij de Hand“ weqfa Rotterdam Samanspelé hate bi pêşxistin.

[1] Em naxwazin bi wênekirinê stereotipan xurt û zêde bikin. Armanc teswîrkirina cûrekirina civaka me ye.

[2] Di sibata 2012'an de li eyaleta Bakur Ren Vestfalya bi zagona ku ketiye meriyetê ya teşwiqkirina entegrasyon û tevlîbûna civakî, di politikayên entegrasyon û perwerdeyê de standartên nû hatin diyarkirin. Di xala 7'emîn ya vê zagonê de di navçe û bajarên serbixwe navendên entegrasyonê yên şaredariyan de tê teşwiqkirin. Dewlet navendên entegrasyonê yên şaredariyan bi riya kargehên koordinasyona eyaletan yên Bakur Ren Vestfalya li kargeha sereke ya kevn a desthilatdariya heremî ya Arnsbergê ve té destek kirin.

# Naverok


Amûrên ji bo dê û bavan ........ 2

Pêşgotin ji bo dêbavan ........ 6

Pêşgotin ji bo piştevanên dêbavan ........ 7

1 Nîşandan ........ 9

2 Çepik ........ 10

3 Xwe hêl kirin ........ 11

4 Tiştek veşartin ........ 12

5 Pirtûk xwendin ........ 13

6 Lotik ........ 14

7 Xêz/çixêz kirin ........ 15

8 Li ajal/heywanan nêrîn ........ 16

9 Li daholê dan ........ 17

10 Vekirin û girtin ........ 18

11 Dans kirin/govend ........ 19

12 Yekî li pêlekanê derdikeve jor ........ 20

13 Ava kirin ........ 21

14 Çay vexwarin ........ 22

15 Tijî û vala kirin ........ 23

16 Bi zarî kirin ........ 24

17 Pirtûk ........ 25

18 Lîstika dest dan û hîs kirinê ........ 26

19 Boyax kirin ........ 27

20 Bot ajotin ........ 28

21 Bi balonan re lîstin ........ 29

22 Pîramîda xeleka ........ 30

23 Kilamek li ser bedenê ........ 31

24 Bi lîstok bebikan re lîstin ........ 32
25 Geştek/ger ........ 33
26 Çav, poz, dev û guh ........ 34
27 Bi kaxizan re lîstin ........ 35
28 Çakûçxane ........ 36
29 Deng derxistin ........ 37
30 Bi kotika daran lîstin ........ 38
31 Li ser heywanan peyivîn ........ 39
32 Bimeş Can, Bimeş Gulê ........ 40
33a Ji hev kirina Pûzil (ava-têk) ........ 41
33b Çêkirina pûzil ........ 42
34 Li ser nigê yekî de meşîn ........ 43
35 Zeliqandin ........ 44
36 Pifkirina gokik ........ 45
37 Dikandarî lîstin ........ 46
38 Bi hev re lîstikan ber hev kirin ........ 47
39 Tik, tik, tik – Dimeşe hespik ........ 48
40 Bi herî/çamûrê lîstin ........ 49
41 Lîstika trên ........ 50
42 Morî pê ve kirin ........ 51
43 Teqle avêtin ........ 52
44 Lîstika tiliyan ........ 53
45 Pirtûkên bi wêne ........ 54
46 Bi boyaxa avîn wêne çêkirin ........ 55
47 Lîstoka lotto ya bi wêne ........ 56
48 Carek hest pê ke ........ 57
49 Lîstika guherandina kincan ........ 58
50 Piyanên li ser hevdu ........ 59

51 Li malê alîkarî ....60

52 Tişta ku ez dibînim, tu nabînî ....61

53 Lîstika bîranîn (memorî) ....62

54 Li derva bi qumê lîstin ....63

55 Gog gindirandin û nîşandan ....64

56 Baş guhdarî bike û bigere ....65

57 Hînbûna kinc li xwe kirin ....66

58 Bixwe pûzilek çêkirin ....67

59 Vegotina çîrokek ji pirtûkê ....68

60 Bi kîseyek yan goreyek vegotin ....69

61 Çi hevdu digirin? ....70

62 Bi lego yan duplo re lîstin ....71

63 Naskirina bedena mirov ....72

64 Malbata min ....73

# Pêşgotin ji bo dêbavan

Dêbavên delal,

meriv dikare rûpelên programa lîstokan ya vê dosyayê berhev bike.

Di van rûpelan de agahiyên alîkar hene, daku lîstokên ku hûn bi zarokê/a xwe re dilîzin, çalakiyên ku bi hev re dikin, bi kêf û şahî derbas be û bi kêr be.

Ev rûpelên lîstokan hatine amade kirin, daku hûn van li malê di ber çavan derbas bikin û lîstokan dîsa bi zarokê/a xwe re bilîzin.

Ji kesên malê re jî naveroka van lîstokan nîşan bidin, da ew jî bi zarokê/a we re bi zanistî bilîzin.

Ger salox/tewsiye û pirsa we li ser naverok û herika rûpelên lîstokan hebe, hûn dikarin hertim ji piştevanên dêbavan re bipirsin.

Em hêvî dikin, ku hûn bi zarokê/a xwe re, bi van lîstikan demên xweş derbas bikin!

# Pêşgotin ji bo piştevanên dêbavan

Piştevanên dêbav ên delal,

ji bo ku em ji we û dê û bavan re pêşkeş bikin, me ji bo koma zarok û dêbavan „Griffbereit“ 64 lîstokên cuda ber hev kirin.

Ev lîstokan bi awayek dêbav û zarok bikaribin bilîzin, hatiye amade kirin.

Em salox didin/tewsiye dikin, ku hefteyê carekê dê û bav bi zarokê/a xwe re bilîzin.

Armanc ev e, ku zarok bi lîstokê şa bibe, him jî lîstok teşwîqa hînbûnê bike.

Hin lîstok ji bo zarokên piçûk, hin jî ji bo zarokên mezintir e.

Hûn dikarin lîstokan li gor sala/emrê zarokên xwe hilbijêrin û pêk bînin.

Lîstokan li gor sal û kêfa zarokan hatine birêz kirin; çi kur çi keç ji bo hemû zarokan.

Fikr û tecrûbe û lîstokên ku dê û bav dizanin jî, divê mirov wan jî bigre ber çavan.

Berî ku hûn dest bi lîstokê dikin, ji dê û bavan re bêjin bê ev lîstok çi bandor li ser geşbûna zarokê/a we dihêle, zarok çi hîn dibe û armanca lîstokê çi ye.

Wek mînak, 4 Tiştek veşartin - Zarok bîra xwe/hişê xwe bi kar tîne û peyvên nû hîn dibe.

Bi zarokê re lîstin, ji bikaranîn û pêşxistina programê girîngtir û pêşdetir e.

Ger fikr û tecrûbeyên dêbavan li programê guncan/lêhatî be, ew dikarin wan jî bi kar bînin.

Xala din a girîng jî, di dema lîstinê de axaftina dêbavan li ser lîstokê ye, da ku zarok ziman hîn bibe û bi hêsanî bipeyive. Tiştên ku zarok dikin û têge û peyvên ku lê tên, zarok zûtir û hêsantir hîn dibin.

Di axaftin û derbirîna fikr û ramanan de zarok çiqas biserketî be, bi qasî wê jî bi zarokên din re dikevin peywendiyê.

Li ser mijarên jêrê bi kûrahî bi dêbavan re bipeyivin.

- Di dema lîstinê de divê dê û bav derfet /îmkan bidin zarokê/a xwe, daku zarok fikra xwe pêş bixe û biryar bide.
  Nimûneya 4. ji bo ku zarok fikra xwe bêje, biryar bide, mirov dikare wiha bipirse: Em li bin rûberê yek yan pir tiştan veşêrin?
  Ev ji aliyê hînbûn û hîndarî/temrîn ve pir girîng e, bi vî awayî zarok hest û daxwaziya xwe tîne ziman.

- Divê dê û bav baş fêm bikin bê lîstok ji bo çi tê lîstin û bandorek/tesîr çawa dike.

- Divê dê û bav xweşgotinan bêjin gava zarok di lîstikê de bi serketî be.

- Di dawiya her lîstokê de hin mînak hene.

Herwiha bi xêra vê grubê, mirov dikare pirtûkên zarokan yên bi wêne û perçeyên lîstokan bide nasandin.

Gelek sipas!

Hûn dikarin *Griffbereit- Pirtûka destan ya piştevanên dêbavan* e bigrin, daku hûn konsepta koma lîstoka Griffbereit pêk bînin.

Di vê pirtûka destan, di derbarê konsepta Griffbereit de, detay û agahiyên pêwîst hene.

Hûn dikarin dosya ya jêrîn ji Internetê daxînin.

Griffbereit (Li ber destan) – Pirtûka destan ya piştevanên dêbavan

64 rûpelên lîstokan bi almanî

64 rûpelên lîstokan bi tirkî

64 rûpelên lîstokan bi rûsî

Bi rûpelên lê zêdekirî berfirehiya programa resen/orîjînal

Stranên zarokan – almanî

Stranên zarokan – tirkî

Stranên zarokan – rûsî

Stranên zarokan – kurdî

Di pêkanîna konsepta Griffbereit, zarok-dê û bav-koma lîstokê de em hêvîdar in, hûn ê bi ser kevin.

# 1 Nîşandan



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Fêmkirina peyvan
- û peyvên ku hîn bûye, bi lêv kirin/dubare kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Derdora we (wek nimûne li malê, li cînarê)

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a xwe bigrin li ser mil yan hembêza xwe.
- Ciyê ku zarokê/a we lê dinêre, hûn jî lê binêrin.
- Nîşan bidin û bêjin, navên tiştên li derdorê çi ne.
- Qenepe, lambe, kursiyek nîşan bidin û navê wan bêjin.
- Ji zarokê/a xwe bipirsin: Lambe li ku ye? Kursî li ku ye?

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tiştên ku ez nîşan didim, tu hema rast nas dikî.

# 2 Çepik



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Peyvan
- Tevgeran/hereket bi zarî kirin
- Rîtman

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Qet tiştek hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Li hemberê hev rûnin, bi hev re kilaman bêjin, herwiha bi hev re heman hereketan bikin.

| | |
|---|---|
| Çepikan lêxe | |
| Çepik lêxe | tey tey tey |
| Niha li ser serê te | hey hey hey |
| Destên xwe bilind ke | ha ha ha |
| Destan li pişt | ka ka ka |

- Kilameke din ku hûn dizanin ji zarokê/a xwe re bêjin û pê re hereketan bikin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu çi xweş destên xwe bilind dikî!
- Tu çi xweş bi min re kilaman dibêjî! (gava deng jê derkeve)

# 3 Xwe hêl kirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi hev re tiştek kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Qet tu materyal hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a xwe li pêş xwe bidin rûnişkandin.
- Hûn jî li paş zarokê/a xwe li ser çokan rûnin.
- Destên xwe di bin çenga zarokê/a xwe derbas bikin û ji bin çokên wî bigrin.
- Jê re bêjin ku hûn ê wî/ê hêl bikin û ber bi pêş ve û ber bi paş ve û pêş û paş.
- Hûn dikarin pê re kilamek jî bêjin: „Hêl, hêl, hêlekan...”

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Bi zarokê xwe/a re bipeyivin û jêre bêjin, ku hûn çi xweş hêl dikin.

# 4 Tiştek veşartin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bikaranîna bîra xwe/hişê xwe
- Peyvên nû

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Rûberek
- Çend tişt, yên ku di bin rûberê bi cî dibin.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bihêlin ku zarokê/a we destê xwe li rûber û tiştan bide. Bala xwe bidin, dibe ku ew dixwaze tiştan bixe devê xwe jî.
- Tiştek li bin rûberê veşêrin, wek nimûne piyanek/îskan
- Ji zarokê xwe bipirsin: "Piyan/şûşe li ku ye?"
- Hûn yan jî zarokê/a we rûber bilind kin, nîşan bidin û bêjin "Piyan li vir e."
- Heman/eynî lîstikê careke din bi tiştên din re jî bilîzin.
- Carek jî rûyê xwe li paş rûberê veşêrin û rûberê bikşînin, bêjin "Çîk"

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Her bijî! Te dît, ku piyan di bin rûber de bû.

# 5 Pirtûk xwendin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Peyvan nas dike
- Wêneyan nas dike
- Hînî pirtûkan dibe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pirtûkên ji karton, plastîk yan ji qumaşê çêbûne, ku tê de yek yan du wêne hene.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a we dikare rûpelên pirtûkê veke/wergerîne û lê binêre.
- Yekeyek wêneyan nîşanî wî bidin û li ser wan tiştekî vebêjin.
- Di derbarê wêneyan de jê pirsan bikin: Şal/pantor) li ku ye? Gelo tu jî şal li xwe dikî?
- Carna ji bo zarokekî/e piçûk li resmekê nêrîn jî bes e.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Bi te re li pirtûkan nêrîn, kêfê dide min!

# 6 Lotik



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi hev re tiştek kirin
- Teraza bedena xwe parastin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Qet tu materyal hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a xwe li hembêza xwe bidin rûnişkandin, bila rûyê wî/ê li we binêre.
- Bi destê xwe çenga zarokê xwe zexm bigrin.
- Pêşî çokeke xwe bilind kin paşî çoka din û wiha bêjin: Bala xwe bide em diçin

Ho ho ho siwar
Lotik bi lotik em diçine war
Gava ew dikeve, dibêje hawar
Bikeve nava çal
Gazî dike heval

- Gava zarokê/a we li çoka we dide, çoka xwe hê jorê bilind kin.
- Hûn dikarin li şûna “lotik” wek nimûne „tew tew“ jî bêjin

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Bi rastî tu gelek xweş lotikan davêjî.

# 7 Xêz/çixêz kirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Girtina pênûsan
- Xêzkirin û paşî jî xêzkirina gilover
- Afirênêriya xwe nîşandan

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pênûsên rengîn û gêc/tebeşîr
- Kaxizeke mezin yan jî karton (ev dikarin kevn jî bibin)

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Pênûs û kaxizê bigrin, bi tevî zarokê/a xwe li dora maseyê rûnin.
- Ji zarokê/a xwe re kaxiz û pênûs yan jî gêc bidin û lê binêrin, bê ew çi dike.
- Jê re nîşan bidin bê mirov çawa xêz dike, nuqte dike.
- Heta ku zarokê/a we bêzar dibe, xêz bikin.
- Di dawiyê de, bi hev re li xêzan binêrin û bêjin hûn çi dibînin.
- Kaxizê xêz kirî li ciyekî bidaliqin yan jî daynin cîkî, lê divê ev pir baş bê dîtin (dîtbar be)

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Ev xêza şîn pir xweş e!
- Her bijî!/aferîn! nuqteyên te gelek baş in!

# 8 Li ajal/heywanan nêrîn



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Heywanên li derdorê nas dike; ew çawa dixuyin? Ew çi dikin? Kîjan dengan derdixin? Gava mirov destê xwe li wan dide, hîsek çawa ye?
- Nav û endamên bedena wan hîn dibe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Yek yan çend heywanên ku mirov bikaribe biçe cem wan (Hûn dikarin herin baxçeyê heywana)

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Ger heywan kedîkirî bin, biçin nêzikê, wan mist bidin.
- Ji zarokê/a xwe re navê heywanan bêjin.
- Dengê heywanan bi zarî (teqlît) bikin û jê bixwazin, da ew jî bi zarî bike.
- Hûn dikarin kilamek li ser heywanan bêjin: Ewt ewt ewt, diewte kuçik.
- Ser, nîg/ling, poçik/dêl û bedena wan nîşan bidin û jê re bêjin, heywan endamên bedena xwe ji bo çi bi kar tîne (gez kirin, li ser piyan sekinîn, nêçîr kirina mêşan û hwd.)
- Lê bişopînin, çi bala wî/ê dikşîne? Di derbarê wan de baxivin, jê re agahî bidin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Aferîn, tu kuçik mist didî, kuçik pê kêfxweş dibe.
- Tu pir xweş bi zarî dengê bizinan dikî: meeee, meeeee.

# 9 Li daholê dan



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi çoyek yan kevçiyek re dengên cuda derdixe.
- Ferqên di navbera dengan dibihîse, ev jî ji bo hînbûna ziman bi kêr tê

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Qutiyek tevî devikê wê (devikê wê baş girtî be). Ev dikare qutiya nok yan birinc be, helbet dikare daholeke rastîn be.
- Çoyek yan kevçiyek

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Qutî bi nok yan birincan tijî bikin, devikê wê jî zexm girê bidin.
- Zarokê/a we dikare pê re bilîze, dikare lê bide yan bigindire.
- Nîşanî wî/ê bidin, bê mirov çawa hêdî û zexm lê dide.
- Gava hûn lê didin pê re bêjin, “hêdî” û “sert/zexm”.
- Nîşanî wî/ê bidin, bê mirov çawa li erdê, derî yan li tiştên din dide.
- Dengê ku hûn dibîhîzin dubare bikin: “Teq, req”
- Hûn jî dikarin tevî wî/ê li erdê xin (bala xwe bidin, cîranên xwe eciz nekin)

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Her bijî! Tu gelek baş dikî!
- Tu dikarî him hêdî him jî sert li erdê bixî!

# 10 Vekirin û girtin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Livandina destê rast û tilî
- Cureyên vekirin û girtinê
- Gencîneya peyvan firehtir dike
- Têgeyên/peyv „vekirî“ û „girtî“ hîn dibe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Tiştên ku bi awayek cuda tên vekirin û girtin. Wek nimûne, qutiya nift, qûşxane, qutiya piskiwêt, dolabek bi derî.

## HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?

- Beroş/quşxane û qutiyan bidin zarokê/a xwe, daku ew wan ji nezik ve bibîne û nas bike.
- Nîşanî wî/ê bidin, bê mirov wan çawa digire û vedike.
- Her car bêjin, “vekirî” û “girtî”
- Nîşanî wî bidin, bê mirov çawa derî vedike û digire.
- Destên zarokê/a xwe bigrin û wan vekin û bigrin.
- Heta ku ew pê kêfxweş e, berdewam bikin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Belê rast e, qutî wiha tê vekirin!
- Tu derî baş digrî!

# 11 Dans kirin/govend



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Guhdarî kirin
- Rîtm
- Tevger tevî rîtm

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Muzîk


**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Muzîkek vekin yan jî bixwe kilamek bistirên.
- Zarokê/a xwe bigrin hembêza xwe yan jî li destên wî bigrin.
- Bi hev re dans bikin/govend bigrin û stran û kilaman bêjin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Çi xweş e, em bi hev re dans dikin!

# 12 Yekî li pêlekanê derdikeve jor



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Tiştek bi hev re kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Materyal hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a xwe li hembêza xwe bidin rûnişkandin, bila rûyê wî/ê li we binêre
- Bi du tiliyan li ser milê zarok heta ser milê wî/ê bimeşin û jê re wiha bêjin:

| |
|---|
| Yekî li pêlekanê derdikeve jor |

- Nermika guhê wî/ê biqidikin...

| |
|---|
| Zirrrrrrr zirrrr |

- Bi hêdîka li eniya wî/ê din...

| |
|---|
| Teq teq |

- Serê pozê wî/ê bigrin…

| |
|---|
| Rojbaş pozmêr! |

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Aferîn tu dikarî pir xweş kurteçîrokan bêjî!
- Tiliyên te jî vê lîstokê pir xweş dilîze!

# 13 Ava kirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Livandina dest û milan
- Pêkanîna ava kirin
- Kordinasyona çav û destan hîn dibe.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Ava-têk (perçeyên lîstokên piçûk, ku bi hev digirin)

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bihêlin zarokê/a we bi perçeyên avahiyê re bilîze û destê xwe li wan de. Jê re eleqe nîşan bidin.
- Nîşanî zarokê/a xwe bidin, bê çawa perçe bi hev re saz dibin.
- Perçeyên hevgirtî bilind kin, da ew bibîne ku perçeyên hevgirtî nakevin.
- Wê dubare bikin, dibe ku ew bi zarî we bike.
- Perçeyên hevgirtî ji hev derxin û şanî wî/ê bidin, bila ew baş bibîne.
- Lê binêrin ka ew jî perçeyan ji hev derdixe yan na.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Rast e, gava mirov bi hêz dikşîne, perçeyan ji hev derdikevin!
- Baş e, tu dikarî êdî ava bikî!

# 14 Çay vexwarin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Xeyal kirin
- Bi hev re lîstin û axaftinê hîn dibe.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Piyana çay yan fîncan
- Kevçiyê çay
- Çaydankeke piçûk

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Tevî zarokê/a xwe li fîncan, kevçî û çaydankê binêrin û li ser wan bipeyivin.
- Wiha bikin, mîna ku hûn çayek tijî dikin û vedixwin.
- Mîna ku hûn çayeke din jî tijî dikin û wê bidin zarokê/a xwe . “Binêr piyaneke çay, tu jî çayekê dixwazî?”
- Jê bixwazin da ew jî çay tijî bike û nîşan bidin, mîna ku hûn wê vedixwin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Bi rastî bi destê te çay vexwarin jî pir xweş e! Ez çayeke din jî dixwazim.
- Tu pir xweş çay tijî dikî. Niha ji kê re çayek didî?

# 15 Tijî û vala kirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Jîrî ya xwe bi pêş dixe.
- Têgeyên „hundir-nav“ û „der“ hîn dibe.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Qutiyeke piyanên plastîk, kevçî û qutiyên vala

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bi zarokê/a xwe re li wan binêrin û bihêlin daku ew bi wan re bilîze heta jê eciz dibe.
- Kevçiyan bixin hundirê piyanan, piyanan jî bixin hundirê qutî.
- Vekirî û zelal bêjin: “Ca binêr, ez kevçiyan dixim NAV piyana û piyanan dixim HUNDIRê qutî.
- Ji zarokê/a xwe re qutiyek piçûk bidin, da ew wê bixe hundirê qutiyeke mezin herwiha alîkariya wî/ê bikin.
- Her tişt JI NAV qutiya mezin derxin û vekirî û zelal bêjin: “Ez hemû JI NAV qutî derdixim”
- di XISTIN û DERXISTINa tiştan de alîkariya zarokê/a xwe bikin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Wiha baş e, tu piyan/şûşe zexm û baş digrî. Ji kerema xwe wan bixe HUNDIRê karton. Kerema xwe kevçî ji nava piyanê derxe. Tu vê jî pir xweş dikî!

# 16 Bi zarî kirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi baldarî şopandin
- Bi zarî yekî kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Tu materyal hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Ji zarokê/a xwe re destê xwe bihejin û jê bipirsin: “Tu bi zarî min dikî? Tu jî destê xwe bihejîne”
- Gava ew destê xwe bilivîne mîna dest hejandin, pesna wî/ê bidin.
- Bi çend caran şûn ve tişteke din bikin, jê bixwazin ku ew bi zarî we bike.
- Hûn kilamek li ser vê mijarê dizanin? Wek nimûne:

ez çûm dikana bebikan-
min dît gelek bebikan
bebikfiroş derket ber dikan
bû kêf û şahiya bebikan
hemû wiha kirin...(çepik)
hemû wiha kirin...(dest hejandin)
hemû wiha kirin...(li daholê dan)

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Her bijî! Tu çi xweş bi zarî dikî.
- Tu pir baş li çepikan dixî; dest dihejînî; li daholê didî.

# 17 Pirtûk



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Li wêne û pirtûkan nêrîn
- Guhdarî kirin û bi lêv kirina peyvan
- Ew hînî pirtûkan dibe û ziman hîn dibe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pirtûkek li ser kincan

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a xwe bigrin hembêza xwe yan jî li qenepe kêleka xwe
- Bihêlin, da ew li wêneyan binêre
- Tiştên ku hûn li pirtûkê dibînin, vebêjin. Çîrokek lê hatî bibînin; tenê navê kincan nebêjin.
- Kincên li pirtûkê, yên xwe û yên zarokê xwe nîşan bidin (Kirasê te li ku ye? Û hwd.)
- Bihêlin, bila zarokê/a we rûpelên pirtûkê wergerîne.
- Gava ew peyvek bêje, hûn wê rastir bikin û bêjin (ger ew ji pantor re bêje “pant”, hûn bêjin “Erê, rast e, ev pantor e”

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu çi xweş û bi baldarî li pirtûkê dinêrî.
- Tu dikarî bi serê xwe rûpelan wergerî

# 18 Lîstika dest dan û hîs kirinê



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi destê xwe li tiştan dan û hîs kirin
- Wateyên/mane peyvan wek hişk, nerm, piçûk, gir, sar, germ

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Çend tişt: hirî, plastîk, dar (hişk), cam, metal û hwd.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Her tişt ber hev kin. Ev dikarin, kevçî, şûşeya şîr, çoçik, qutiya plastîk, lîstok bibin.
- Bi zarokê/a xwe dest û rûyê xwe li wan bidin û baş hîs bikin.
- Û hestên xwe bi zarokê/a xwe re bipeyivin.
- Hişk-nerm, piçûk-mezin, sar-germ û baş û xirabûna wan bêjin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Bi rastî fîkreke baş e, tu pozê xwe li wan didî û hîs dikî.
- Aferîn! rast e, ev sar e (dibe ku zarokê/a we nikare peyva “sar” bêje lê ew ê paşî wê hîn bibe)

# 19 Boyax kirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Livandina destan
- Hevkariya çav û dest
- Nîşandana afirênêriya xwe, bikaranîna fantaziya xwe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Li bin zarokê gincirek, pîneyek yan naylonek raxin
- Rûpeleke rojname yan kaxizek, da ew li ser wê boyax bike.
- Firçeyeke fireh a milqut
- Hundirê şûşeyeke piçûk, boyax û avê tev li hev bikin
- Tûrikeke plastîk a sergoyê û meqes

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Pîneyek li ser mase raxin û zarokê/a xwe re bêjin, bê hûn ê çi bikin.
- Tûrikê di sê ciyan de qul bikin, da ser û milên zarokê/a we tê re derbas be, wê mîna pêşmalk bikaribe li xwe bike.
- Firçe, boyax û rojnameyê amade bikin.
- Firçeya xwe bixin nava boyaxê û li ser rojname xêzeke stûr bikşînin yan jî nuqteyek bikin.
- Firçe ji zarokê/a xwe bidin. Heta hewce neke alîkarî nekin, bihêlin bila ew bixwe çêkirina wêneyek biceribîne.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Ev nuqteya sor pir xweş e.

# 20 Bot ajotin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Peyv
- Bi hev re lîstin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Qet materyalek hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Li erdê hemberê zarokê xwe rûnin, da hevdu bikaribin bibînin.
- Destên zarokê/a xwe bigrin.
- Mîna ku hûn li botê ne; destên zarokê xwe ber bi xwe ve bikşînin, pişta xwe paş xwe ve daynin, paşî destên zarokê ber bi pêş ve tehm din û ber bi pêş ve bitewin, mîna bêrkêş.
- Leza xwe biguherînin yan jî tenê li aliyekî bêr bikşînin.
- Pê re bipeyivin yan stranek bistirên.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Bijî! Tu çi xweş bot dajo û bêrik dikşînî!

# 21 Bi balonan re lîstin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi tiştên malê re derfeta lîstikên cuda bi dest dixe
- Bi lîstina balonan re zêdetir tevdigere

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Yek yan çend balon
- Dibe ku bend jî hewce bike

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Hinek pif bikin û balonê binepixînin, devikê balonê piçek vekin da deng jê derkeve.
- Balonê pif bikin û paşî berdin, da ku wir de wê de bifire.
- Ji careke din ve balonê pif bikin (bala xwe bidinê gava biteqe, zarokê/a we ditirse) bi bend yan bê bend devikê wê girê bidin.
- Bila zarokê/a we destê xwe lê bide, bişîdîne, bêhn bike, lêxe, veşêre. Hûn tim bêjin bê zarokê/a we çi dike.
- Hûn dikarin bi hev re, bi balonê bilîzin û ji hevdu re bavêjin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Gava tu li balonê dixî, gelek jorê difire!
- Tu pir xweş pê digrî!

# 22 Pîramîda xeleka



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bikaranîna destên xwe
- Hay ji cudahiya reng û piçûk-mezinahiya xeleka bûn
- Hevkariya çav û destan

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pîramîdek ji xelekan

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Tevî zarokê/a xwe li erdê rûnin û jê re bêjin, bê hûn ê çi bikin.
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa xelekan li darika pîramîdê derbas dike (Di destpêkê de rêzên xelekan ne girîng e.)
- Hûn dikarin xelekan bigindirin yan jî li ser hevdu jî daynin.
- Tiştên ku hûn dikin, yekeyek jê re bêjin.
- Ji zarokê/a xwe re pîramîdê bidin, da ew pê re bilîze heta ku jê eciz bibe.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Aferîn, tu dikarî xelekan li ser serê xwe jî daynî.
- Bi rastî te pîramîdek pir xweş çêkir.
- Him jî tu dikarî xelekan pir xweş bigindirî.

# 23 Kilamek li ser bedenê



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Peyvên perçeyên bedenê
- Bi muzîkê re tevgerîn

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Kilamek

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Li hemberê hev rûnin
- Bi hev re kilamekê bêjin, wek nimûne “Çavên min wenda bûn”
- Yan jî helbestek bêjin û pê re bi aheng tevbigerin.

Destan li newq, him rast him çep
Destan li pişt, bike tişt mişt
Destan li çok, difire kevok
Destan li zik, lêxe çepik

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu pir xweş kilaman dibêjî! Belê him jî dans bike!
- Tu jixwe bedena xwe nas dikî!

# 24 Bi lîstok bebikan re lîstin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bûyerên ku di bîra wî/ê de mane, dibin lîstik
- Xwe dixe rolên cuda û bi awayê lîstikê xwe derbirîn/îfade kirin
- Ziman (peyv û hevok) saz kirin
- Divê ev lîstik bi kuran re jî bê lîstin, ne tenê bi keçan.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Bebikên cuda (mê û nêr), hirçik...
- Kevçî û binika çay (tiştên li malê)
- Pîneyek, pêjgîr û kîsikek

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Pêşî bihêlin zarokê/a we bi bebikan re bi serbestî bilîze.
- Gelo bebik birçî dibin? Kevçî û binika çayê bigrin û nîşan bidin mîna ku hûn ji bebikê re xwarin didin xwarinê.
- Bebik xwarina xwe rijandiye; nîşanî zarokê/a xwe bidin bê çawa mirov serê bebikê dişo.
- Dûre nîşan bidin bê çawa mirov bi pêjgîrê dorpêç dike.
- Bihêlin ew careke din ve bebikan re bilîze herwiha lê bişopînin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu şîrînayî bi bebik didî xwarinê?
- Tu ji bebika xwe pir hez dikî.
- Te jê re navekî da?
- Bi rastî ev navekî xweş e.

# 25 Geştek/ger



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Meşîna rasterast
- Peyv û hevok...

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Tiştek hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Li hundir yan derva bigerin
- Ciyê ku zarokê/a we lê dinêre, hûn jî lê binêrin û tiştek li ser wan vebêjin:


> "Li wê derva ye. Em carekê li derva binêrin?
> Tu li wê çi dibînî, darek û kuçikek?
> Kûçik dimeşe. Poçikê kûçikê heye, tu lê dibînî? Kûçik poçikê xwe dihejîne.
> Tu çi dibihîsî, erebeyek?
> Binêr, çi otombîleke mezin e."

- Ger hûn bi zimanê dayikê zarokê/a xwe re bipeyivin, zarokê/a we dikare xweş bipeyive.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu dikarî dûr bimeşî!
- Tu bi min re rast û baş dipeyivî!

# 26 Çav, poz, dev û guh



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Binavkirina perçeyên serê me
- Eger hûn pirtûkek bi kar bînin, zarokê/a we hînî pirtûkan dibe: tiştên ku di pirtûkan de hene, di jiyana rastîn de jî hene.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pirtûkek bi wêneyên rû yan jî mirov dikare lîstok bebik jî bi kar bîne.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bi devê xwe re ez dikarim çi bikim? Axaftin yan xwarin. Jê re bêjin, mirov pê çi dikare bike.
- Guhê xwe nîşan bidin: "Ev guhê min e. Guhek te jî heye." Paşî nîşanî guhê zarokê/a xwe bikin û bêjin: "Ev guhê te ye, da ku tu bibîhîsî."
- Heman tiştê dubare bikin û jê bixwazin ew guhê we nîşan bide. Dibe ku zarokê/a we peyva "Guh" jî bi lêv dike.
- Dev, çav û pozê xwe nîşan bidin. Ger zarokê/a we kêfxweş be careke din jî hinarik/gupik û çene ya xwe nîşan bidin.
- Li pirtûkê yan li ser bebikê jî hûn dikarin perçeyên serê mirovan nîşan bidin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Belê, rast e, ev guhê te ye (ew nikaribe vê peyvê bêje jî ew ê ji we bibîhîse û rojekê rast bi lêv bike.)

# 27 Bi kaxizan re lîstin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Destê xwe li kaxizê dide, wê nas dike bê mirov çi dikare bi kaxizan re bike.
- Bikaranîn û birêvebirina destê xwe hîn dibe
- Cudahiya dengan hîn dibe – ev ji bo hînbûna ziman baş e.
- Şikl û form, piçûk û mezinahî, ...

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Kaxiz tûrikek vala, zarfekê bikaranî, rojnameyeke kevn, pela kaxizeke sipî.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Kaxizê bidin ji zarokê/a xwe, da ku li ser wê bikaribe bifikre, herî baş ew ji bo çi bi kêr tê?
- Hûn vebêjin bê zarokê we bi kaxizê re çi dike?
- Nîşanî wî/ê bidin, ka mirov bi kaxizê re hê çi tiştên din dikare bike. Bo nimûne kaxizê gilover bikin mîna borî û şanî wî/ê bidin, da mirov dikare tê re bipeyive...
- Kaxizê biçirînin, boyax bikin, qat bikin ...
- Jê bipirsin bê ka mirov hê dikare çi bike.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Careke din jî biceribîne!
- Tu dikarî bi kaxizê pir dengan derbixî!
- Aferîn! bi rastî te baş fikiriye, mirov dikare wiha jî bike!

# 28 Çakûçxane



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bikaranîn û tevgerandina tilî, dest û mil
- Hevkariya dest û çav. Dîtin û kirin
- Gencîneya peyvan berfireh kirin
- Naskirina derdor

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Çakûçxane

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Ji zarokê/a xwe re çakûç û qutiya wê bidin da ew pê re bilîze.
- Lê binêrin û tiştên ku ew dike li ser wan bipeyivin
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa taximê alavan bi kar tîne, wek mînak, bê çawa mirov mix/bizmar dikute.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu gelek baş li mixê didî!
- Careke zexm lêxe: GUMM! Careke hêdî lêxe: Teq, teq! Baş!
- Aferîn! tu rast dikî!

# 29 Deng derxistin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Livandina lêv: ev ji bo axaftinê baş e.
- Guhdariya deng û peyvan: ev ji bo ziman baş e.
- Bala xwe dan û bi zarî yekî kirin.
- Serwextbûna zarokê bi pêş dikeve.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Qet materyalek hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Li hember zarokê/a xwe rûnin, da ew devê we bibîne.
- Lêvên xwe milçemilç bikin û pif bikin, lê binêrin bê ew bi zarî we dike.
- Navê heywanek bêjin, ku tê nas kirin û biceribînin dengê heywanê derxin. Biesekinin, dibeku ew jî bi zarî we dike.
- Nişanî erebok, saet, çaydank, quşxaneya bipîpik bidin û biceribîn dengê wan derxin. Ihtîmaleke mezin zarokê/a we dê bi zarî we bike.
- Kartoneke giloverkirî bigrin devê xwe û tê re bipeyivin, tişt miştan bêjin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu pir xweş bi zarî otombîl dikî!
- “Sssss” belê rast e, mar dengekî wiha derdixe.

# 30 Bi kotika daran lîstin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bikaranîna dest û milan
- Tesîra yekem a ava kirin û xerab kirin.
- Cîhana xeyala xwe berfireh dike.
- Hevkariya çav û destan
- Navê rengan hîn dibe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Kotika daran yan qutiyan

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Kotika daran yan qutiyan bidin zarokê/a xwe û bihêlin heta ku ew bi lîstina wan eciz dibe.
- Lîstika zarokê/a xwe binêrin/bişopînin û tiştên ku ew dike li ser wan bipeyivin.
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa bi kotikan/qutiyan bircek çêdike.
- Bi zarokê/a xwe re bircê hilweşînin û careke din ve wê ava bikin.
- Ji kotikan rêzek çêkin mîna trênek. Ger ew bişiqitin zarokê/a we dikare wê bide ajotin.
- Kotikan bi gora rengan rêz bikin, li cem hev yan li paş hev.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Te birceke pir mezin çêkir/ava kir!
- Te ji bo trêna xwe jî rengekî xweş hilbijart!

# 31 Li ser heywanan peyivîn



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Nasîna heywanan
- Bi baldarî guhdarî kirin
- Li wêneyan nêrîn
- Hînî pirtûkan dibe.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Di derbarê heywanan de pirtûkeke rengîn
- Heywanên ji qumaş çêbûyî

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a we dikare pirtûkek bigire û lê binêre.
- Heywanek nîşan bidin û bêjin çi tiştên wî balkêş e.
- Jê bipirsin: “Çêlek li ku ye? Nîşan bide. Erê, niha jî nîşan bide, hesp li ku ye?
- Pêşî hûn dengê heywanan derxin û paşî jê bipirsin: “Çêlek çi dike? Hesp çi dike?
- Ger zarokê/a we 2 yan 3 salî be, hûn dikarin taybetmendiya heywanan vebêjin. Ker bi hêz e û dikare bar bikşîne. Pisik piçûk e û pûrtê wî/ê nerm e.
- Gava zarokê/a we nikaribe peyvek bi lêv bike, hingê hûn dikarin peyvê di nav hevokek de bi kar bînin.
- Gava zarokê/a we bêje “Pisî” jê re bêjin “Belê, li wê pisikekî reş dimeşe”

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Belê, ev kuçikek e, te rast nîşan da!
- Tu pir xweş bi zarî dengê heywanan dikî!

# 32 Bimeş Can, Bimeş Gulê



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Peyv, deng û rîtman
- Lêgerîna tiştê winda

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pênûsên rengîn

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Li tiliyek herdu destên xwe wêneya rû çêkin (Yek Can yek jî Gulê)
- Nîşanî zarokê/a xwe bikin, jê re bêjin yek Can ya din jî Gulê ye û bêjin ku ew bi hev re diçin meşê.
- Bi tiliyên xwe li ser mase bimeşin mîna ku Can û Gulê ne.

| |
|---|
| Du meriv dimeşiyan<br>Li deşt û çiyan<br>Navê yekî Can (Tiliyek xwe bilind kin)<br>Yê din Gulê (Tiliya din bilind kin)<br>Bimeş, Can (Can li paş pişta xwe veşêrin)<br>Bimeş, Gulê (Gulê li paş pişta xwe veşêrin)<br>Vegere Can (Can Nîşanî wî/ê bidin)<br>Vegere Gulê (Gulê Nîşanî wî/ê bidin) |

- Strana xwe dîsa bêjin û gava hûn Can û Gulê vedişêrin, ji zarokê/a xwe re bipirsin bê ew çûne ku.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Her bijî! Te dît ku Can û Gulê li paş min de bûn.

# 33a Ji hev kirina Pûzil (ava-têk)



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi tiliya beranê û nîşanê, girtina tiştan hîn dibe
- Bikaranîn û birêvebirina destên xwe hîn dibe
- Hevkariya çav û destan
- Li wêneyan tam û baş nêrîn

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Mamikên bi bişkok (Wêne ji bişkokan tê girtin û ji hev tê veqetandin)

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bila zarokê/a we serbestî bi mamikê re bilîze.
- Di demeke şûn de wêneyan şanî wî/ê bidin û li ser wan bipeyivin.
- Teşwîq bikin û jê bixwazin ku bila ew jî wêneyan nîşan bide.
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa wêneyek ji mamikê derdixe/ji hev dike.
- Piranî zarok bi zarî we dike, ger ew bi zarî we neke jê bixwazin, da ew bi zarî we bike. Herwiha hûn dikarin perçeyên pûzilan li hev xin, daku deng jê derkeve û ev bibe lîstika dengan.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Belê rast e, gava tu mamika resiman ters digrî, wêne dikevin xwarê.
- Tu resman rast digrî/derdixî/ji hev dikî!

# 33b Çêkirina pûzil



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Wêne û şiklan dibîne û bi hev diguncîne/li hev tîne: ev ji bo jîrî ya wî/ê erênî ye (baş e).
- Bi zanistî bikaranîn û birêvebirina tilî û destên xwe hîn dibe.
- Hevkarî di navbera tiliya beranê û nîşanê de pêk tîne.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Ger zarokê/a we 1 salî be: Mamika bi bişkok
- Ger hê mezin be: Pêşî mamika bi çar wêne paşî jî zêdetir wêne

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bi zarokê xwe re, di derbarê wêneyên mamikê de bipeyivin.
- Du perçe pûzil derxin.
- Nîşan bidin bê mirov çawa dikare du perçe puzil li hev bîne; heta ku şûnê bibînin, perçeyê puzilê bizivirînin û bigerînin.
- Jê bixwazin, ku perçeyekî bixe şûnê (ger ew nikaribe, alîkariya wî/ê bikin).
- Ne tenê bi destê xwe herwiha bi peyvan jî alîkarî zarokê/a xwe bikin, wek mînak “Bizivire, piçekî din jî bizivirîne, hinek paş de bîne, belê niha temam bû!”
- Gava bi ser nekeve dibe ku zarokê/a we xemgîn be yan hêrs bibe. Hingê wî/ê teselî bikin û hema perçeyekî hêsan bidinê.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Te perçeyê pûzilan rast bi cî kir.

# 34 Li ser nigê yekî de meşîn



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Hevkarî
- Pêkanîna teraza beden

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Tu tişt hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**


- Zarokê/a xwe li ser nigê xwe daynin, destên wî/ê bigrin û bi vî awayî pê re bimeşin.
- Car hêdî car zû bimeşin û bêjin: “hêdî” û “zû”.
- Car gaveke piçûk, car gaveke mezin bavêjin û bêjin: “piçûk” û “mezin”
- Mîna heywanan bimeşin: mîna ordeg, mîna hespan birevin, ...
- Zarokê/a xwe ters wergerînin (pişta wî/ê li we zivirî be) û wiha bimeşin.
- Hûn dikarin helbestek jî pê re bêjin:

Çîmikek, du çîp
Piyek, du pê dimeşin li çîmen
Çîmek, du çîm digerin li mêrg
Heta ku zarokê/a min mezin bû

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu dikarî gavên mezin bavêjî! Tu dikarî gavên zû bavêjî! Tu dikarî ber bi paş ve jî bimeşî!

# 35 Zeliqandin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Dest tên xebitandin
- Hevkariya çav û destan
- Bikaranîna zeliq
- Hest tê bi pêş xistin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Rojnameyeke kevn, da hûn li erdê raxin
- Kaxizek, mirov bikaribe wê biçirîne.
- Pela kaxizeke hişk
- Zeliq

## HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?

- Tiştên ku hewce dikin nîşanî zarokê/a xwe bikin û jê re bêjin, navê wan çi ne.
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa kaxizê diçirîne.
- Jê bixwazin da ew jî kaxizek biçirîne.
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa zeliq bi kar tîne.
- Jê bixwazin, da ew jî li ser kaxizê zeliq bide.
- Perçeyên kaxizê zeliq lêdayî bi hev re bigrin û li ser kaxizê hişk bizeliqînin û pê re bipeyivin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu dikarî baş kaxizan biçirînî! Tu dikarî hişk pê lê bikî!
- Te ew pir xweş zeliqand!

# 36 Pifkirina gokik



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi zanistî hesîna bêhn
- Bi bikaranîna bêhna xwe tişteke din kirin.
- Masûlkên dev û rast axaftin tên xebitandin.
- Bi zanistî bikaranîna lêv û ziman.
- Dor bi dor tiştan kirin û kesên din re lîstin.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Goga pînpongê/tenîsa mase yan jî giloka pembû
- Du pîpet (çoyên qul ji bo vexwarinê)
- Neynikek

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Goga pîngpongê bidin zarokê/a xwe daku wê bibîne û nas bike.
- Jê re bêjin bi gogê re çi tê kirin.
- Li ser maseyê, gogê ber bi zarokê/a xwe pif bikin.
- Jê bixwazin da ew jî pif bike.
- Ger ew bi serkeve gogê ji yek û din re pif bikin.
- Herwiha hûn dikarin bi pîpetan jî pif bikin.
- Di pifkirinê de li neynikê binêrin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu dikarî pir baş gokikê pif bikî!
- Tu dikarî gokikê heta dûr pif bikî!

# 37 Dikandarî lîstin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bûyerên rojane dike lîstok û dubare dike
- Bi hev re lîstin
- Gelek peyv û hevokên nû hîn dibe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Çenteyek yan tûrikek
- Qutiya vala ya şîr, piyanên (şûşe) plastîk, qutiyan
- Cizdanekî kevn
- Wek pere (dirav) bişkok, lîstok pere yan jî Sent (Cent)

## HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?

- Yek û yek danustandina xwe ji zarokê/a xwe re bidin.
- Pere, çente yan jî qutiyê bigrin û zarokê xwe dawetî lîstikê bikin: “Rojbaş ez dixwazim tiştek ji we bikirim. Hûn dikarin ji min re lîtreyekî şîr bidin?”
- Ger hewce bike, alîkariya zarokê/a xwe bikin bê mirov çawa rola dikandarî dike: “Niha tu ji min re şîr didî û bêje: `Ji kerema xwe yek Euro`.”
- Hûn dikarin tiştên din jî bikirin, wan bixin çenteyê xwe, heqê wan bidin ji zarokê/a xwe.
- Xwe wek bikirekî sohbetxweş nîşan bidin û li ser tiştên ku we kiriye, bipeyivin.
- Rolên xwe biguherînin, dibeku zarokê/a we jî dixwaze carekê bibe bikir.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu dikarî gelek baş danustandinê bikî!
- Tu dikandarek baş î!
- Te gelek tiştan firot!

# 38 Bi hev re lîstikan ber hev kirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi hev re bi tiştan ve mijûl bûn
- Hevkariya çav û destan
- Rêk û pêkkirina derdora xwe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Hin qutiyên lîstikan
- Lîstokên tev li hev bûyî

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Qutiyên lîstokan bidin zarokê/a xwe bala xwe bidin, da ew çi dike.
- Jê re bêjin ku ew qutiyên lîstokan in û hûn ê lîstikan ber hev bikin û bixin hundirê qutiyan.
- Jê re lîstokên ku ji heman/eynî cûre ne, bidin (mînak, Lego/Duplo) û jê bixwazin, da ku ew wan bixe hundirê qutiyê.
- Divê mirov ji zarokên şeş salî piçûktir re, di berhevkirinê de alîkarî bike.
- Ji bo cureyeke din a lîstokan qutiyeke din bikar bînin (mînak erebok)

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Em erebokan ji kîjan qutiyê bixin? Hundirê wê? Ev fîkreke baş e, wiha bikin! Tu pir baş dikî!
- Gelek baş e, tu dikarî lîstokên xwe ji hev cuda bikî!

# 39 Tik, tik, tik – Dimeşe hespik



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi hev re lîstokek lîstin
- Awaz û rîtm û peyvan hîn dibe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Tiştek hewce nake.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a xwe bigrin hembêza xwe û çokên xwe jêrê û jorê ve bihejin: “Tu dixwazî hesp bajo?”
- Di bin çenga zarokê xwe zexm bigrin.
- Berdewam bikin çokên xwe bihejînin û hê zûtir “Ço, ço, deh hespê min bazde”
- Bi peyva dawî zarokê xwe jorê ve bilind kin û bi lez çokê xwe jêrê ve bikşînin.
- Hûn dikarin wiha bêjîn:

Ço, ço, ço hespê min bajo!
li ser daran û keviran
deh deh deh!
baz dide çargav

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu dikarî xwe zexm bigrî!
- Aferîn tu lîstoka siwariyê baş dilîzî!

# 40 Bi herî/çamûrê lîstin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Hesteke nû hîn dibe û tiliyên xwe yek û yek tevdigere
- Materyalên nû hîn dibe û bixwe dikare form bide wan

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pêşî bi tenê rengekî, paşî bi rengên din jî çamûr ji bo lîstinê
- Pîneyek ji bo raxistinê, dikare karton jî bibe


**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Ji zarokê/a xwe re hinek çamûr bidin da ew destê xwe lê bide û nas bike.
- Hûn jî hinek çamûr bigrin û pê forman çêkin. Wek mînak hûn dikarin paste, kurm, spagetî yan jî gokik çêkin.
- Bala xwe bidinê tiştên ku zarokê/a we dike û li ser wan bipeyivin: “Te çamûr ji hev qetand, niha wan kom bike, aferîn”
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa bi tiliya xwe qulek vedike.
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa bi kevçiyê çay yan jî bi neynûkê li çamûrê xêz dike.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu bi çamûrê baş kar dikî!
- Tu dikarî gokek, marek xweş çêbikî!

# 41 Lîstika trên



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi hev re tiştek kirin. Ev girîng e, ji ber ku bi kesên din re xebatê hîn dibe.
- Ev ji bo temrîna/hîndarî hevkarî pêwîst e.
- Ev derfet dide, da ku zarok fantazî (xeyal) û kapasîteya xwe bi serbestî biceribîne.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Odeyek fireh da zarok bi rehetî bikaribe bimeşe.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a xwe bigrin hembêza xwe, zarokê/a we yê/a 2-3 salî jî ji paş we bigre.
- Bimeşin û ji zarokê/a xwe re bêjin, ku hûn lîstoka trênê dilîzin. Guhdarî bike: Dîdî, tût tût
- Hêdî bi hêdî bi lez kin, mîna trênek.
- Bila fîtika trênê jî bidin bihîstin.
- Bihêlin carek jî zarokê we bibe lokomotîf, vîrajan derbas bike û fîtik xe.
- Stranek wiha lê tê:

Dîdî dîdî
Trên diçe
Dîdî dîdî
Çi xweş diçe
Bi lez diçe
Tût tût dike

- Hûn dikarin kursî ji paş hevdu bi rêz bikin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu pir xweş lîstoka trênan dilîzî!

# 42 Morî pê ve kirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bikaranîn û birêvebirina destên xwe hîn dibe.
- Hevkariya çav û destan

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Moriyên mezin
- Ta (bend) yan jî kordon (bendê sola jî dikare bibe)

## HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?

- Bila zarokê/a we bi bend û kordonê re bilîze.
- Moriyên mezin ji ta derbas bikin û bendê girê bidin.
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa morî ji ta derbas dike.
- Gava hûn ta ber bi jorê ve bilind kin dê morî ber bi jêrê ve bişiqite.
- Ta bigrin û jê bixwazin daku zarokê/a we jî moriyek ji ta derbas bike.
- Jê bixwazin, ku bila ew bixwe tayek bigre û tê re morî derbas bike.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Wiha ye, tu bendê rast digrî!
- Tu dikarî moriyan baş derbas bikî!

# 43 Teqle avêtin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bikaranîn û birêvebirina bedena xwe hîn dibe
- û bi vî awayî baştir tevdigere

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Ji bo raxistina erdê xalîçeyek yan betaniyeyeke nerm

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Ger hûn dikarin teqleyeke hêdî bavêjin, zarokê/a we jî bila bibîne.
- Alîkarî bikin bila zarokê we ser çoka xwe xwar bibe, destên wî/ê jî li ser xalîçe be.
- Alîkariya wî/ê bikin daku zarokê/a we serê xwe di nav milên xwe re derbas bike. Di vê kêlikê de hûn destê xwe daynin paş hustiyê wî/ê.
- Bi destê din re qûna wî/ê bigrin û bilind kin, da ew bikaribe teqle bavêje.
- Bihêlin bila zarok bixwe biceribîne. Hûn piçek alîkarî bikin.
- Ger ew nexweze ser wî/ê neçin. Hûn dikarin lîstokeke hêsantir bilîzin. Wek mînak hûn dikarin kilamek bêjin û di dawiya kilamê de hûn dikarin xwe li erdê bigindirînin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu çi xweş teqle davêjî û xwe li erdê digindirî!

# 44 Lîstika tiliyan



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Baş bala xwe dan û nêrîn (mêze kirin)
- Awaz û rîtm û peyvan hîn dibe
- Ev amadekariyeke baş e ji bo hînbûna ziman.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pênûseke ser şilbûyî

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Hûn dikarin li ser serê tiliya xwe resma rûyekê çêkin.
- Bihêlin bila zarokê we bi tiliya we re bilîze, pê re hûn dikarin helbesta jêrîn bixwînin.

Pênc mêr çûn daristan
Ji bo nêçîra kergûşkan
Yekem qelew bû mîna hirçan
Duyem go: Va ye, ew dimeşe
Sêyem, ya dirêj xemgîn bû
Dest bi girînê kir û go: ez kesî nabînim!
Çarem go: êdî bes e, ez vedigerim
Lê ya piçûk kê ew fikirî
Wî kêrgûşk anî malê
Yekser herkes keniya: Ha ha ha!

- Ger zarokê/a we 1 yan 2 salî be, hûn dikarin tiliyên zarokê/a xwe yek û yek (dor bi dor) bigrin dema hûn helbestê dibêjin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Belê, rast e ev tiliya beranê ya te ye!

# 45 Pirtûkên bi wêne



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Li nêrîna wêneyan
- Tiştên tên gotin wan guhdarî kirin
- Hînî pirtûkan dibe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pirtûka rengîn

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Pirtûkê bidin zarokê/a xwe lê bişopînin û tiştek bêjin.
- Di derbarê wêneyên ku hûn li pirtûkê de dibînin, bipeyivin.
- Bihêlin da ew rûpelên pirtûkê wergerîne.
- Gava zarokê/a we peyvan rast bi lêv neke, wan peyvan di hevokê de bi kar bînin û serast bikin (Gava ew ji hirç re bêje “Hir” hûn jî bêjin “Belê, ev hirç e, ez wî dibînim”

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Bi te re wêneyên pirtûkan nêrîn jî kêfê dide min.
- Gelek baş e, tu dikarî di derbarê wêneyan de bipeyivî.

# 46 Bi boyaxa avîn wêne çêkirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Temrîna/hîndarî hereketkirina destan
- Hevkariya çav û dest: Paşerojê di hînbûna nivisînê de, ev pêwîst e.
- Xwe derbirîn/îfade kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Firçeyeke fireh û kaxizê ku avê dikşîne xwe, wek mînak kaxizê dîwaran
- Yek yan du rengên avîn, di şûşeyan de (şûşeyên ku bi hêsanî narijin)
- Sungêreke şil
- Ji bo raxistina erdê plastîkeke mezin, turên sergoyê, pêştemal, kirasek yan bluzeke kevn

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Pêştemalek li zarokê xwe kin û jê re bêjin, ku hûn ê bi hev re bi boyaxa avîn resman çêkin.
- Navên rengan jî pê re bêjin.
- Kaxizê daynin li ser tura plastîk û bi sungera şil re şil bikin.
- Firçe bidin zarokê/a xwe û nîşanî boyaxan bikin “Tu dikarî bi vî rengî boyax bikî”
- Pêşî zarokê/a we dikare tilî/destê xwe bixe nava reng, şopa tilî/destê xwe li kaxizê birengîne.
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa firçe dixe nava şûşe/qutiya boyaxê.
- Pêşî hûn nuqte û xêz li kaxizê çêkin da ew bibîne mirov çawa nuqte û xêz dike.
- Bi zarokê/a xwe re binêrin bê reng çawa belav dibin.
- Hûn dikarin rengekî duyem jî bi kar bînin. Dema hûn boyax dikin zarokê/a xwe jî teşwîq dikin, ku zarok bi zarî dikin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tiştên ku ez nîşan didim, tu hema rast nas dikî

# 47 Lîstoka lotto ya bi wêne



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi hev re li gor rêbaza lîstokê lîstin
- Peyv û têgeyên nû
- Cudahî û wekhevî yên resman nas kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Lîstoka Lotto ya bi wêne

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bi zarokê/a xwe re li wêneyan binêrin û li ser resman bipeyivin.
- Pê derxin, bê çima û kîjan resimok li hev tên.
- Hûn û zarokê/a we karteke mezin bigrin.
- Ji resimokan yekê bigrin, li karta mezin şûna ku lê tê, daynin. Ger nebe li kêlekê bihêlin.
- Hemû resimokan wergerînin, da ew xûya nekin.
- Dor bi dor resimokan bigrin û di karta mezin de li ciyê rast bi cî bikin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Te ev hema nas kir, kursî li karta te tê!

# 48 Carek hest pê ke



Zarokê/a we çi hîn dibe?
- Bi destan hest pê kirin
- Pê derxistin, bê mirov çi hîs dike

We çi divê/ji we re çi lazim e?
- Tiştên ku zarokê/a we nas dike
  Sar - germ
  Hişk - nerm
  Req/hişk - avîn

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bila zarokê/a we destê xwe li her tiştan bide û wan nas bike.
- Li ser materyalan bipeyivin: hûn çi hîs dikin, ev nerm yan hişk, germ yan sar, sivik yan giran in?
- Hûn herdu jî li bin maseyê veşêrin.
- Di bin maseyê de tiştek ji zarokê xwe re bidin.
- Ji zarokê/a xwe bipirsin bê jê çi hest dike.
- Niha bila zarokê/a we tiştek di bin maseyê de ji we re bide û vêca hûn jê re bêjin hesta wê çi ye.
- Bi vî awayî dor bi dor berdewam dike.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.
- Belê, rast e, kevir sar e.
- Erê, rast e, fayke nerm e.

# 49 Lîstika guherandina kincan



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Rol kirin û ketin rola yekî din
- Xeyal kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pîneyeke nerm, wek mînak stûberekê

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bihêlin zarokê/a we bi pîneyê re bilîze, çawa ew dixwaze.
- Jê bipirsin hîsa pîneyê çi ye û wê çi reng hene.
- Hûn nîşanî wî/ê nedin, bihêlin bila zarok bixwe biceribîne, divê ew bixwe bibîne pîne çawa tê bikaranîn.
- Nîşanî wî/ê bidin (pêş wî/ê bikin) pîneyek wek kum, laçik yan betaniye çawa tê bikaranîn.
- Alîkariya wî/ê bikin dema ew pîneyê girê dide.
- Bila ew xwe li neynûkê bibîne.
- Gava zarok pîneyê wek pêşmalk li xwe ke, mîna ku ew aşpêj e, jê bipirsin bê ew ê çi bipije.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Fikra te baş e, niha pîne bû betaniye!

# 50 Piyanên li ser hevdu



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bikaranîn û birêvebirina mil û destan
- Hevkariya çav û destan
- Têgeyên cî û şûnan: li ser, li bin, li cem, li hundir, li paş, li pêş
- Nasîn û binavkirina rengan

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Şûşeyên ku li ser hev bi rêz dibin (Matrûşka)

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Lê binêrin, bê ew bi şûşeyan re çawa dilîze û jê re bêjin, bê ew çi dike.
- Bi hev re şûşeyan LI SER hev daynin û peyva LI SER bikirpînin.
- Ji zarokê/a xwe bixwazin, da ew jî şûşeyan li ser hev dayne. Gava ew bi ser nekeve ji nû ve nîşanî wî/ê bidin.
- Heta ku zarokê/a we jê aciz dibe, lîstokên bi vî rengî bilîzin lê şûşeyan wer rêz bikin, ku peyvên LI HUNDIR, LI KÊLEK, LI PAŞ bila bê bikaranîn.
- Ger ew bixwaze bi serê xwe bi wan re bilîze wî/ê bihêlin. Lê pê re bipeyivin: “Binêr! Te şûşeya sor xist hundirê şûşeya zer.“
- Gava hûn rengên şûşeyan jî bêjin, zarokê/a we wan jî hîn dibe.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu şûşeyan rast û baş LI SER HEVDU bi rêz dikî.
- Niha ez wan li kêlekê datînim, tu jî dikarî?

# 51 Li malê alîkarî



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Xwe bawerî
- Xweserî
- Bawerî bi tiştek kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Çend mandalên kincan û kincên şil; kartol ji bo spîkirin yan jî şûşeyên plastîk ji bo şûştinê.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Karek peyda bikin, ku zarokê/a we bikaribe alîkariya we bike. Bo nimûne; Danûstandina market/bazarê derxin û lê nîşan bidin bê mirov wan çawa berhev dike.
  Bila ew ji we re mandal bide gava hûn kincên şûştî didalêqin.
  Ew dikare kartolên spîkirî bixe nav quşxane/beroşê.
- Hûn dikarin ji zarokê/a xwe bipirsin: „Dixwazî alîkariya min bikî?”, “Tu dikarî ji min re mandalan bidî?”
- Bi zarokê/a xwe re mase amade bikin.
- Di derbarê karên malê de, bi zarokê xwe re bipeyivin: Em danûstandina bazarê bi cî bikin? Em çima kincên şûştî didalêqin?”
- Ji zarokê/a xwe bipirsin: Lambe li ku ye? Kursî li ku ye?

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Gelek sipas, te pir alîkariya min kir!

# 52 Tişta ku ez dibînim, tu nabînî



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi baldarî nêrîn
- Ferqa rengan
- Gava reng û tiştan bi nav dike, peyvên nû hîn dibe.
- Bi hev re li gor rêbaza lîstokê lîstin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Tiştek hewce nake

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Ji zarokê/a xwe bixwazin tiştên ku li odeyê heman reng in, bila şanî we bide. Bi vî awayî hûn dikarin pê derxin bê ew vî rengî dizane yan na.
- Tişteke SOR ku li odeya we heye, bifikrin û bêjin: “Tişta ku ez dibînim lê tu nabînî, ev SOR e.
- Bihêlin da ew bifikre bê hûn çi tişt difikirin. Bêjin GERM, gava ew tişta ku we fikiriye li nêzikê wê nîşan bide. Bêjin SAR gava tişta ku ew dibêje li dûr be.
- Îcar zarokê/a we tiştekê bifikre û hûn pê derxin.
- Tişta ku ji daran yan camê çêbûye, bifikrin, wek mînak “Tişta ku ez dibînim tu nabînî ji daran çêbûye?”
- Zarokê/a we dikare wê tiştê nîşan bide yan bêje.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Germ, hema hema te pê derxist!
- Bijî, te çi xweş pê derxist!

# 53 Lîstika bîranîn (memorî)



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Peyv û têgeyên nû
- Cudahî û wekhevî yên resman nasîn
- Hinek di bîra xwe de girtin
- Bi hev re li gor rêbaza lîstokê lîstin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pêşî çar cot kartên memorî, dûre hê zêdetir

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bi hev re resman binêrin û di derbarê resman de baxivin û jê pirsan bikin: “Tu li vir çi dibînî?”
- Kartan wergerînin bila aliyê resman xûya bike û kartên cot daynin cem hev.
- Gava zarokê/a we ev fêm bike, hûn dikarin binêrin hê çi tiştên din cotê hev in û çima (wek mînak sêv û hirmî cotê hev in ji ber ku herdu jî mêwe/fêkî ne; kursî û mase cotê hev in ji ber ku herdu jî mobîlya ne).
- Vêca kartan wergerînin.
- Alîkariya zarokê/a xwe bikin, daku ew bikaribe kartan tev li hev bike.
- Dor bi dor du kartan wergerînin, ger resman ne cot bin wan daynin dîsa şûna xwe lê ger resman cotê hev bin wan bigrin.
- Gava mirov kartên cot bibîne, dikare wan dayne aliyek û du kartên nû wergerîne.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Belê rast e, ev herdu kart cotê hev in!

# 54 Li derva bi qumê lîstin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Hesta qum çi ye û mirov dikare pê çi bike
- Tiştek bi qumê ava kirin
- Ji xeyalên xwe re form dan

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Ji bo lîstina zarokan ciyê qum
- Leganek qum li balkonê jî dibe
- Satileke piçûk tijî av

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Kincên ku hûn li zarokê xwe dikin, bizanibin ku ew ê qilêr/qirêj bibin.
- Bihêlin zarokê/a we bi avê û qumê re serbestî bilîze (gelek zarok qum davêjin nava avê yan jî av dirijînin ser qumê û pê kêfxweş dibin.
- Li zarokê/a xwe binêrin, bikenin, serê xwe bihejînin û wiha eleqe ya xwe nîşan bidin.
- Gava zarokê/a we destê xwe li qumê dide pê re bipeyivin, bê ew çi hîs dike (şil, ziha, piçûk, nerm...)
- Bi zarokê xwe re wek mînak, bi qumê pasteyek çêkin, çiyayekî bilind û tûnelek tê re derbas dibe.
- Piştre qumên rijiyayî bi hev re berhev bikin û bixin şûna xwe.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Te pasteyeke xweş çêkir!

# 55 Gog gindirandin û nîşandan



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Birêvebirina tilî, dest û milê xwe
- Hevkariya çav, dest û milan
- Bi gogê lîstokên cuda lîstin
- Bi hev re lîstin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Gogeke sivik û nerm

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Gogê nîşanî zarokê xwe bidin û li ser form, sivikahî û giraniya wê bipeyivin.
- Bihêlin, bila ew biceribîne ka mirov bi gogê çi dikare bike.
- Hûn dikarin ji hevdu re gogê bavêjin, bigindirin, zipzip kin.
- Di destpêkê de şûneke mezin hilbijêrin wek mînak deriyek, dûre hûn dikarin şûneke piçûk, wek mînak di navbera lingên kursiyê.
- Ger ew serketî be, hûn dikarin lingê mase yan piyaneke plastîk ji xwe re bikin hedef.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu gogê pir xweş digindirî û hema davêjî hedefa xwe!

# 56 Baş guhdarî bike û bigere



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Baş guhdarî kirin
- û peyvên ku hîn bûye, bi lêv kirin/dubare kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Odeyeke bêdeng, ciyê ku radyo û televîzyon girtî ye.
- Saeta ku ditike yan jî tiştеke din ku deng jê tê.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bi zarî dengê saetekê bikin û bi zarokê/a xwe re kilamekê bêjin.

> Saetên mezin dikin teq-req, teq-req
> Saetên piçûk dikin dikin çik-çik, çik-çik
> Saetên destan dikin çik çik

- Ji zarokê/a xwe bixwazin, ew çavê xwe bigre heta ku hûn saetê vedişêrin.
- Jê bixwazin ew saetê bibîne, bila baş guhdarî ke û bigere.
- Ger ew bixwaze îca ew bixwe saetê veşêre û hûn ê lê bigerin.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Te baş guhdarî kir û saet dît, aferîn!

# 57 Hînbûna kinc li xwe kirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Tiştek bi serê xwe kirin
- Bawerî bixwe anîn û xwe mezin hîs kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Kincên cuda

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Kincên cuda li xwe kin wek mînak piştî serşûştinê (atlet/kiras/fayke/gore/...).
- Çakêtê vekin û li erdê raxin, circira wê li jorê, hustiyê wê ber bi we ve bibe.
- Bila zarokê/a we li erdê xwar bibe û hûn alîkariya wî/ê bikin daku ew destên xwe li milê çakêtê derbas bike.
- Paş çaketê li ser wî/ê derbas bikin bi vî awayî zarokê/a we çakêt li xwe kiriye.
- Heta ku zarokê/a we bixwaze vê dubare bikin.
- Dûre çaketê li ser maseyekê nizm raxin.
- Nîşanî wî/ê bidin bê mirov çawa çaket vedike û digre.
- Jê bixwazin bila heman/eynî tiştê dubare bike, ger ew bi ser nekeve alîkariya wî/ê bikin da ew dîsa biceribîne: “Carekê jî wiha biceribîne”

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Aferîn, tu pir xweş dikî!

# 58 Bixwe pûzilek çêkirin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Birêvebirina masûlke yên tilî û destan
- Pêkanîna hevkariya çav û destan
- Di derbarê şikl û forman de fikirîn
- Ji perçeyên resmekê/wêne, resmeke bitun çêkirin.

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Wêneyek, kartoneke zirav û zeliq yan jî kartpostalek
- Meqesa zarokan

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Wêneyek ku zarokê/a we pê kêfxweş dibe bigrin û di derbarê wê de bipeyivin: “Tu çi dibînî? Tişta ku tu diecibînî (xweşa te diçe) heye?
- Dûre zeliq li aliyekê/goşeyeke kartonê bidin û wêneyê li ser bizeliqin.
- Jê re bêjin, ku hûn ê ji vê resmê puzilekê çêkin û wê perçe bi perçe jêbikin.
- Zarokê/a we kartpostal yan resmê ku we zeliqandiye bila wê jê ke û bike du perçe, ger hewce be alîkariya wî/ê bikin.
- Ger ew dikare wan perçeyan dîsa jêke, bike çar perçe û bila perçeyên lê hatî dayne li cem hev.
- Ger hewce be alîkariya wî/ê bikin, gava ew nikaribe wêneyên lê hatî bîne cem hev.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Te perçeyên wêneyê rast anî li cem hev! Belê, wiha rast e!

# 59 Vegotina çîrokek ji pirtûkê



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Peyvên nû
- Ji peyvan hevok saz kirin
- Baş guhdarî kirin
- Hînî pirtûkan dibe

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Pirtûkeke zarokan bi çîrokên wêne

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bi zarokê xwe ve li resman binêrin û di derbarê wan de bipeyivin.
- Pirtûkê beş bi beş bixwînin yan jî vebêjin û herwiha nîşanî resman bidin.
- Di derbarê pirtûkê de ji zarokê/a xwe pirsan bikin, wek mînak "… ê çi bikira? … biçûya ku? Niha wê çi bibe?
- Peyvên ku zarokê/a we lê rast tê, bidin zanîn û wêneya wan jî nîşan bidin.
- Çîrokê bi dengên cuda bixwînin û vebêjin. Dengê Hirç bi dengekî bilind bêjin. "Xor! , hingiveke şîrîn, ez dixwazim hingiv bixwim".
- Çîrokê vebêjin û jê bixwazin, da ew jî dubare bike, gava ew çîrokê vedibêje hûn dikarin bi pirsan alîkariya wî/ê bikin: „… li wê çi dike? Li vir çi qewimî?"

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu dikarî çîrokên xweş bêjî!

# 60 Bi kîseyek yan goreyek vegotin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bikaranîna xeyala xwe
- Sazkirina hevokên zelal
- Çareserkirina pirsgirekan/problem
- Bi kesên din re ponîjin/fikirîn

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Kîseyek yan goreyek

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Gore yan kîseyê bixin destê xwe (yan jî bebikeke rastî bi kar bînin).
- Bi tiliya beranê û tiliyên din re dev çêkin. Bi tevgerandina tiliyên xwe vî devî bidin axaftin.
- Devê destebebikê vekin û bigrin mîna ku hûn dixwazin poz yan milê zarokê/a xwe gez bikin: “Ez dixwazim te gez bikim...Hamm! (Ger zarokê/a we pê kêfxweş be, dubare bikin.)
- Destbebik dikare ji zarokê/a we re behsa problemek bike wek mînak “Min kuma xwe wenda kir, divê ez wê li ku bigerim? ...Lê ne li wê ye. Divê ez niha çi bikim?”.
- Armanca lîstokê ev e, ku zarokê/a we bi bîr û zanebûna xwe, bi we re bikeve diyalogê û çare ji bo probleman bibîne.
- Gava destbebik devê xwe hereket bike û bi dengekî din bipeyive, lîstok zêdetir kêfê bide.
- Gore yan kîseyek jî bixin destê zarokê xwe, da ew jî bi destbebikê xwe re bikaribe bipeyive.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Va ye, te kuma xwe jî dît!
- Tu bebikê re çi xweş qise dikî!

# 61 Çi hevdu digirin?



Zarokê/a we çi hîn dibe?
- Bi baldarî nêrîn û tiştan dan ber hev
- Bikaranîna hiş
- Peyv û termên nû

We çi divê/ji we re çi lazim e?
- Tiştên li malê yên heman cure, wek mînak, kevçiyên cuda, tayên cuda, mandalên rengcuda, bişkok ...

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Tiştên guncan (lêhatî) ber hev kin.
- Bi riya pirsan zarokê/a xwe dawetî axaftinê bikin: "Em vê ... ji bo çi bi kar tînin?"
- Hûn şanî wî/ê bidin bê ew çawa tên bikaranîn û navê wan çi ne.
- Ji zarokê/a xwe bixwazin tiştan cure bi cure kom bike.
- Mandalan li gor rengên xwe kom bikin, sor alîkî, zer alîkî, kesk alîkî, kêrik û çetelan jî li gor mezinahî dayne alîkî, çetelan alîkî, kevçiyan alîkî, kevçiyên darîn alîkî, kevçiyên metal alîkî.
- Tiştên ku em pê xwarin dixwin, ji çetel, kêrik, û kevçiyan re taximê sifreyê tê gotin; sor û zer re jî reng tê gotin; hin tişt jî texte, plastîk û metal in, bi wan mirov dikare gelek tiştan çêbike.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.
- Aferîn ev mandal zer e. Di şûna xwe de ye!
- Tu pir xweş ji hev dikî!

# 62 Bi lego yan duplo re lîstin



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Bi Lego û Duplo ava kirin
- Ji xeyalên xwe şikl û form dan
- Hevkariya ser û dest

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Lego û Duplo

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Zarokê/a we bi dil û kêfa xwe Lego û Duplo bilîze.
- Eleqe nîşan bidin û wî/ê teşwîq bikin.
- Nîşanî wî/ê bidin, bê mirov çawa perçeyên Lego û Duplo ji hev dike.
- Bila ew bixwe perçeyên Lego ji hev ke yan jî pê, lîstokên din bilîze. Ger ew bi ser nekeve û alîkarî ji we bixwaze, aliyê wî/ê bikin.
- Avahiya ku zarokê/a we bixwe çêkiriye, hûn jî pê bilîzin.
- Bipeyivin û jê pirsan bikin: “Ev malek e? Ev keştî ye? Qaptanê wê kî ye? Qaptan çi dike? Deryavan jî hene?

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Tu perçeyan baş li hev tînî!
- Birca ku te çêkiriye pir bilind e!

# 63 Naskirina bedena mirov



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Di derbarê bedena xwe de agahdar bûn
- Endamên bedena xwe nas kirin

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Neynikek
- Wêneya zarokek
- Pirtûkek li ser endamên bedenê

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Bi zarokê xwe re li pirtûkê binêrin, jê re bêjin ku hûn ê li ser endamên bedenê bipeyivin.
- Tiştên ku bîr û bala zarokê dikşîne hûn jî lê binêrin û yekeyek navên wan hînî wî/ê bikin.
- Di derbarê endamên bedenê de jê pirsan bikin: „Navê vî/ê çi ye? Ev li kîjan aliyê bedenê te ye? Di bedena min de jî ev heye? Tu pê çi dikî? Zarok pê çêdike?
- Ger hewce bike tîpên destpêkê yên peyv û hevokan bêjin, da ew bersiva we bide.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Belê rast e, ev çîp e. Çîpê te li ku ye?

# 64 Malbata min



Zarokê/a we çi hîn dibe?

- Nasîna ferdên malbata xwe
- Peyvên nû li ser malbatê
- Têgihiştina têkiliya malbatê

We çi divê/ji we re çi lazim e?

- Wêneyên malbatê yan jî kaxizek û pênûsek bo resim çêkirin.

**HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?**

- Resman nîşanî wî/ê bidin, bila pê derxe bê ew resmên kî ne. Hûn jê bixwazin da ew eqrebayên/xizm û nas nîşanî we bide.
- Hûn dikarin resmên merivên xwe çêkin. Helbet naşibe fotografê lê ew jî dibe alîkar, ku jixwe armanc li ser malbatê axaftin e.
- Wî/ê jî teşwîq bikin da ew jî resim çêke, qet şaş nebin ku nuqte yan giloverên ku wî/ê xêz kirine, mirov in.
- Bi alîkariya fotograf yan resiman di berbarê malbata xwe de bi zarokê xwe re bipeyivin; yên li foto kî ne; li ku dimînin; tecrûbeyên we û zarokê bi wan re çi ne û her wekî din.
- Behsa têkiliya malbatê bikin: “Dapîra/pîrik te diya min e, apê/mam te birayê bavê te ye, ...”
- Jê bixwazin da ew di foto de dor bi dor hemû zarok, jin û mêran nîşanî we bide.

Bêjin, tiştên ku zarokê/a we rast dike.

- Belê rast e, bapîrê/kalik te bavê min e.
- Te ew baş nas kir!